Ji Penûsê Jinê Rastiye Jiyanê

# RAPERÎN

Dîrok: Gulan 2022 Hejmar: 05

# Bi Têkoşîna Jinan a Hevbeş Wê Dagirker Têk Biçin



# بنضال المرآة المشترك سينهزم الاحتلال

*Îro ji çar parçeyê Kurdistanê heta Rojhilata Navîn û heta tevahî cîhanê şerên bi destê hêzên kapîtalîst û emperyalî tên meşandin. Bêguman hedefa şerên emperyaliyetê yên yekemîn jin û zarok in. Ji ber ku jin misogeriya azadiya tevahî civakê ye, zarok jî misogeriya pêşerojê ne. Niha bi destê dewleta Tirk a dagirker û faşîst ji Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûrî heta Başûrê Kurdistanê û heta erdnigariya Rojhilata Navîn şerekî hebûn û tunebûnê tê meşandin. Armanca yekemîn a dewleta Tirk bi meşandin û mezinkirina vî şerî ew e ku dixwaze bibe hêzeke herêmî.*

*Li dijî siyaseta dewleta Tirk di destpêkê de pêwîst e tevahî jinên bindest ku dibin hedefa dagirkerî û feraseta serdestiya zilamperest xwe rêxistin bikin. Li dijî siyaseta dagirkeriyê ya herêmî pêwîst e em bi armanca mezinkirina sazgêreke têkoşînê ya hevbeş tev bigerin. Yekîtî û serkeftina jinan têkçûna dagirkeriyê ye. Erka me ya herî mezin ew e ku li dijî hêz û siyaseta herêmî ya kapîtalîzm û emperyaliyetê em têkoşîna hevbeş a jinên tevahî Rojhilata Navîn mezin bikin. Şoreşa Rojava ya jinê ji bo vê yekê derfet û bingeke gelekî xurt e. Li ser gotina Marks a "Tevahî karkerên cîhanê bibin yek" îro wek pêwîstiyeke serkeftina li dijî serdestiya zilamperest em dibêjin "Tevahî Jinên karker û kedkar ên cîhanê bibin yek"*

اليوم ، تشن الحروب من قبل القوات الرأسمالية والإمبريالية من جميع أجزاء كردستان الأربعة إلى الشرق الأوسط وجميع أنحاء العالم. بالطبع كان هدف الحروب الإمبراطورية الأولى من النساء والأطفال. لأن المرأة هي ضمانة حرية المجتمع بأسره ، فالأطفال هم أيضًا ضمانة المستقبل. هناك حرب من غرب وشمال وشرق سوريا إلى جنوب كردستان وحتى الشرق الأوسط من قبل الدولة التركية المحتلة والفاشية. الهدف الأول للدولة التركية في شن هذه الحرب وتصعيدها هو أن تصبح قوة إقليمية. ضد سياسات الدولة التركية من الضروري تنظيم كل النساء المضطهدات اللواتي هن هدف المحتلين ومفهوم الهيمنة الذكورية. ضد سياسات الاحتلال المحلي ، نحتاج إلى العمل معًا بهدف تعزيز هيكل تنظيمي مشترك. وحدة المرأة ونجاحها هزيمة للاحتلال. إن أعظم مهمتنا هي تكثيف النضال المشترك للمرأة في جميع أنحاء الشرق الأوسط ضد القوة والسياسات الإقليمية للرأسمالية والإمبريالية. إن ثورة المرأة الغربية فرصة قوية للغاية وأساس لذلك. على حد تعبير ماركس ، "يجب أن يتحد جميع عمال العالم بأسره" ، نقول اليوم "يجب أن تتحد جميع النساء والعاملين في العالم" كشرط مسبق للانتصار على حكم الرجل الذي يهيمن عليه.

NÊRÎN 2
*Ji Bo Azadiyê Şoreş, Ji Bo Şoreşê Rêxistinbûn!*
لأجل الحرية الثورة ولأجل الثورة التنظيم

DOSYE 4
Gelekî Ku Tu Carî Nayê Radestgirtin: Filîstîn
الكثير الذي لن يتم استسلامه أبدًا : فلسطين

ROJEV 8
Ji Bo Şoreşa Jin Têkoşîna Yekbûyî Ya Jin
في الشرق الاوسط لأجل ثورة المراة نضال وحده المراة

# Ji Bo Azadiyê Şoreş, Ji Bo Şoreşê Rêxistinbûn!

Jin pêşengên şoreşa civakîne. Îstîqameta bîrdoziya têkoşînê diyar dikin. Rêzkariya bîrdozî û rêxistinî ya Jinên Komunîst ên Şoreşger (JKŞ) bingeha xwe ji vir digire. Jinên ku li hemberî pergala kapîtalîst a zilamperest bi serbilindî, bi rûmet, bi biryardarî têkoşîn dikin ne tenê xwe, civakê jî azad dikin. JKŞ'ê xwe li hemberî zilamperestiyê bi meşandina têkoşîna polîtîk sînordar nake. Ew di heman demê de kesayeta jina azad, komunîstek şoreşger jî di xwe de ava dike. JKŞ'ê dibistaneke ku jinê di têkoşîna şoreşger de pêşeng dike ye. JKŞ'ê rêhevaltî, parvekirin, hevbeşîbûyin e. JKŞ'ê girêdaniya bi şoreşê ye. Her jina komunîst a şoreşger pêwîst e bi van erkên xwe ve pir xurt were girêdan.

Me daneheveke ku em ê ji gelek aliyan ve kiryarên xwe binirxînin li paş xwe hişt. Li gorî rojevên tijî yên meha Sibat, Adar, Avrêl û Gulanê me demeke tijî jiyan kir.

Şahiyên ku berî 8'ê Adarê me birêxistin kirin, alên me yên JKŞ'ê ku di meşên 8'ê Adarê û mitîngan de pêlpêlan, xebatên me yên Newrozê, bîranînên rêberê komunîst Baran Serhat, bi dû ve jî xebatên 1'ê Gulanê rojevên me yên esasî bûn.

Hemû rêhevalên me û meclîsên me bi qasî ku xebatên xwe tehlîl bikin bûn xwedî daneyan. Meclîsên me û yek yek rêhevalên me wê xwe binirxînin, bi qasî serkeftinên xwe wê kêmasiyên xwe jî veguherînin hêzekê. Şîdeta şoreşger a rexne û rexnedayinê wê bibe hêza kaşker a guherîn û pêşketinê û di kiryar û planlamayên hîn xurtir ên dema nû de wê bersiva xwe bibîne.

Em nêzî salvegera şehadeta Elende El Muhamed ango rêheval Zîlan dibin. Em xwe amade dikin ku wê bi bîr bînin. Wan bi keda xwe têkoşîna me ya şoreşger mezin kirin û erk û berpirsiyariyên nû dan ser milên me. Hemû jinên komunîst û meclîsên me gelo amadene ku rapora xebatên saleke bêyî wê derbasbûye bidin rêheval Zîlan.



Anha dem dema di şewqa hemû dersên ku me derxistine de ji bo erk û berpirsiyariyên nû ketina tevgerê ye.

Bi hêza ku me ji xebatên Adar û Gulanê girtiye, ji bo erkên dema nû bigirin ser xwe em têkevin tevgerê. Erkên dema nû li dora van du rojevên esas em dikarin bigirin dest.

**Li dijî dagirkerî û mêtîngeriyê li ber xwe bide Gerîla Biparêze! Şoreşê Mezin Bike!**

Bêyî hêzên şoreşger ên pêşengên çekdarî ku bi tarzê fedaî cih girtine şoreşa me nikare xwe biparêze. Bêyî ku têkoşîna gerîla ku ji piştevana esasî ya şoreşa me ye neyê parastin şoreşa me nikare were parastin. Bi êrîşên ku par di 24'ê Avrêlê de dest pê kirin û di 17'ê vê Avrêlê de weke konsepteke şer a hatiye nûkirin berdewam kirine tê xwestin ku gerîla ji cihên xwe werin hilkirin. PDK'ê bi dewleta Tirk a dagirker û mêtînger re tevdigere. NATO û hêzên koalîsyonê jî piştgiriya tam didin vê êrîşa dagirkeriyê.

Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê di bin gefeke mezin de ye. Gelê me yê Êzidî bi fermaneke nû ve rû bi rû ne. Di êrîşa DAÎŞ'ê de di serî de jinên Êzidî û gelê me îşkenceyên mezin jiyan kirin. Bi rêkeftina ku di 9'ê Cotmehê de hat xitimkirin re êrîşeke nû hat destpêkirin. Ji 3'ê Gulanê ve artêşa Iraqê Şengal dorpêç kiriye. Teslîmgirtina gelekî ku di dibistana demokrasiyê re derbasbûye, hilweşandina pergala wan wê ne hêsan be. Li hemberî êrîşeke nîjadkujî û îşkenceyeke nû ya li dijî jin û gelê Êzidî wê li Şengal û her deverê berxwedan were bilindkirin.

Gerîla li Avaşîn, Zap û Kurêjahro berxwedaneke mezin nîşan dide. Nahêle ku mêtîngeriya dagirker û xeta xiyanetkar a PDK'ê serbikeve. Anha berxwedana bajarên Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê wê hêz bide berxwedana gerîla, wê bibe nîşaneya têkeçûniyê. Parastina binyata xweser û demokratîk a Bakur û Rojhilatê




Sûriyeyê û qedera gerîla bi hev re pir xurt girêdayî ye. Di gerîla de israr di xeta gelparêz demokratîk û azadîxwaziya jinê ya şoreşa me de israr e.

JKŞ'ya ku xeta Kurdistana Yekbûyî, Serbixwe, Azad ji xwe re kiriye rêber, dê parastina şoreşa me ya jinê di xeta welatparêziya sosyalîst de bidomîne. Dê rê nede dagirkeran.

**Dirûşma vê demê: curetkariya polîtîk, firehbûna rêxistinî û kûrbûyina bîrdozî!**

Têkoşîna bi nirxên feodalî ku şoreşa me ji hundir ve dixwin û şiklê jiyana burjuwayî û têkoşîna li dijî êrîşên Dewleta Tirk ên dagirkerî û mêtîngeriyê divê bibin yek. Jinên me yên ciwan hîna jî azadiyê di zewaca temenê biçûk de û di avakirina mala xwe de dibînin. Li gel ku zagonên me zewaca di temenê biçûk de qedexe kirine hikmê zagonê di jiyanê de lawaz dimîne. Xwedîbûna zarok an jî malekê ne azadî, ne jî serxwebûn e. Ji bo ne pêwîst e ku em li nazariyat an jî dîrokê binehêrin. Em li dayik, xaltîk, metika xwe yan jî cîraneke xwe ku zewiciye binehêrin jî ev rastî dê were dîtin. Ev ne tenê weke xwesteka jina ciwan, ji malbatê heya civakê weke zexteke civakî berdewam dike. Ji bo jinê ji rêxistinbûnê pê ve rê tune ye. Jina şoreşger û rêxistinbûyî wê zilam jî biguherîne. Jiyana wekhev û azad bedewiya ku her jin û zilam heq dikin e.

JKŞ'ê pêwîst e jina ku dixwaze biryarên xwe bi xwe bide û vê yekê di zewacê de dibîne ji bo bigihîne asta azadiya şoreşger xebateke xurt a îqnakirinê bimeşîne.

Di tundiya li dijî jinê de zêdebûn çêdibe, xwekuştinên jinan tên dîtin. Tundiya li dijî jinê ne qeder e. Ji bo ku jin li dijî tundiyê bêdengiya xwe xera bikin pêwîst e bîrdariyê qezenc bikin. JKŞ'ê bi xebatên xwe birina vê bîrdariyê ji jinan re pêwîst e erka xwe ya sereke bibîne. Di her qadê de di rêxistinbûnê de divê kûr bibe û curbicuriya xwe ya rêxistinî zêde bike. Perwerdeya bîrdozî û polîtîk teqez divê domdar bibe.

Divê her hevdîtin, her ziyareta malan jî kargehan, her civîna meclîsê weke perwerde bigirin dest. Divê em ji jinan re nebin cîran û heval, em bibin rêhevalên şoreşger. Xebatên avakirina şoreşê di malan de bênavber divê berdewam bikin. Şoreşeke dûrî malê di jiyana civakî de her ku biçe wê bêhêz bibe.

Ji bo statuya şoreşa me ya ku li ser wekhevî û azadiyê bilind dibe di nav gelan de qezenc kiriye were parastin JKŞ'ê divê rola xwe ya pêşengtiyê bilîze.

Meclîsên me yên JKŞ'ê û her rêhevaleke JKŞ'yî ji bo ku şoreşa me ya jinê bê navber pêş ve biçe berpirsiyar e.

Şoreşa me jinên Kurd, Ereb, Ermen, Suryan, Aşurî, Êzidî û ji her netew û baweriyan di têkoşîna azadiya jinê de li hemberî pergala resmalî ya zilamperest kir yek. Jinên ku malên wan, gundên wan dûrî hev in, baweriyên wan cuda ne îro di heman mewziyan de nobetê digirin, di heman meclîsan de erk digirin, hemû erkên şoreşê bi hev re radikin. Yekîtiya jinan wê li çiya û bajaran dagirkeran têk bibe û di avakirina jiyana nû de meşa bi biryardarî wê berdewam bike.

An Serkeftin An Serkeftin!

# لأجل الحرية الثورة ولأجل الثورة التنظيم

النساء هن رائدات الثورة الاجتماعية. تحديد اتجاه أيديولوجية النضال. النظام الأيديولوجي والتنظيمي للمرأة الشيوعية الثورية (JKŞ) مشتق من هنا. النساء اللواتي يناضلن بكل فخر وبشرفة وحزم ضد النظام الرأسمالي الذي يهيمن عليه الذكور ، لا يحررن أنفسهن فحسب ، بل يحررن المجتمع أيضًا. لا يقتصر JKŞ على خوض نضال سياسي ضد العنصرية. كما أنها تبني في نفسها امرأة حرة ، شيوعية ثورية. JKŞ هي مدرسة تأخذ فيها النساء زمام المبادرة في النضال الثوري. JKŞ هي الصداقة والمشاركة والمشاركة. إن JKŞ متصل بالثورة. تحتاج كل امرأة شيوعية ثورية إلى أن تكون مرتبطة بقوة بهذه المسؤوليات.

لقد تركنا وراءنا بيانات سنقيم أفعالنا من زوايا عديدة. لقد عشنا حياة كاملة وفقًا للأجندات الكاملة لشهر فبراير ومارس وأبريل ومايو.

الاحتفالات التي أقيمت قبل ٨ مارس ، أعلامنا التي تم رفعها خلال مسيرات وتجمعات ٨ مارس ، وأنشطة نوروز الخاصة بنا ، وذكريات القائد الشيوعي باران سرحات ، ثم أنشطة الأول من مايو هي على جدول الأعمال. منها الرئيسية.

كان لدى جميع زملائنا وأعضاء المجالس بيانات كافية لتحليل عملهم. مجالسنا ورفاقنا واحدًا تلو الآخر سيقيمون أنفسهم ، بقدر ما ستواجه نجاحاتهم عيوبها.

تتحول إلى قوة. سيصبح العنف الثوري للنقد والنقد القوة الدافعة للتغيير والتنمية وسيجد إجابته في إجراءات وخطط أقوى في العصر الجديد.

نقترب من ذكرى استشهاد إلندا المحمد أو الرفيقة زيلان. نحن نعد أنفسنا لتذكرها. من خلال عملهم الجاد ، قاموا بتضخيم نضالنا الثوري ووضعوا واجبات ومسؤوليات جديدة على عاتقنا. هل كل نسائنا ومجالسنا الشيوعية على استعداد لتقديم تقرير عن أعمال عام بدونه إلى الرفيقة زيلان؟

حان الوقت الآن للانتقال إلى مهام ومسؤوليات جديدة في ضوء جميع الدروس التي تعلمناها.

مع القوة التي أخذناها من عمل مارس-مايو ، نتخذ إجراءات لتحمل مسؤوليات زمنية جديدة. يمكن القيام بمهام زمنية جديدة حول هذين البرنامجي الاساسيين

## سنحمي الكريلا ونكبر الثورة

لا يمكن لثورتنا أن تدافع عن نفسها بدون القوات الثورية للقادة المسلحين الذين أخذوا مكانهم بأسلوب فداء. لا يمكن الدفاع عن ثورتنا دون الدفاع عن حرب الكريلا التي هي الداعم الرئيسي لثورتنا. دعت الهجمات ، التي بدأت في ٢٤ أبريل من العام الماضي واستمرت في ١٧ أبريل بمفهوم متجدد للحرب ، إلى إبعاد المقاتلين عن مواقعهم. يتعامل حزب الديمقراطي الكردستاني مع الدولة التركية المحتلة والديكتاتورية. كما دعمت قوات الناتو والتحالف بشكل كامل هذا الغزو.

مجلس الحكم الذاتي الديمقراطي في السند معرض لتهديد كبير. يواجه شعبنا الأيزيدي نظامًا جديدًا. تعرضت النساء الأيزيديات وشعبنا للتعذيب الشديد خلال تمرد داعش. بدأ هجوم جديد بالاتفاق الذي تم التوصل إليه في ٩ أكتوبر. يحاصر الجيش العراقي شنكال منذ ٣ مايو. لن يكون الاستسلام للعديد من الذين مروا بمدرسة الديمقراطية وتفكيك نظامهم سهلاً. سترتفع المقاومة في وجه هجوم إبادة جماعية وشكل جديد من أشكال التعذيب ضد النساء والناس الأيزيديات في شنكال وأماكن أخرى.

يظهر كيريلا مقاومة كبيرة في آفاشين وزاب وكوريجاهرو. فهو لا يسمح بدكتاتورية المحتل والخط الغادر لحزب PDK أن يسودوا. الآن مقاومة مدن شمال وجنوب وشرق كردستان ستقوي مقاومة الكريلا ، وستكون علامة على الهزيمة. يرتبط الدفاع عن البنية التحتية المستقلة والديمقراطية لشمال وشرق سوريا ومصير الكريلا ارتباطًا وثيقًا. الإصرار على حرب الكريلا هو الإصرار على الخط الديمقراطي الديمقراطي وتحرير المرأة لثورتنا.

ستواصل JKŞ ، التي قادت خط كردستان الحرة المستقلة ، الدفاع عن ثورتنا النسائية على غرار الوطنية الاشتراكية. لن تسمح للغزاة.

## شعار العصر: تنوع سياسي وتوسع تنظيمي وتعميق أيديولوجي!

يجب أن يصبح النضال مع القيم الإقطاعية التي تغذي ثورتنا من الداخل وطريقة الحياة البرجوازية والنضال ضد هجمات دولة الاحتلال والدكتاتورية التركية واحدًا. لا تزال شاباتنا يجدن الحرية في الزواج في سن مبكرة وفي بناء منزلهن. على الرغم من أن قوانيننا تحظر الزواج في سن مبكرة ، إلا أن سيادة القانون تظل ضعيفة في الحياة. إنجاب طفل أو منزل ليس حرية ولا استقلال. ليس من الضروري بالنسبة لنا أن ننظر إلى النظرية أو التاريخ. وسواء نظرنا إلى أمنا أو خالتنا أو عمنا أو جارنا المتزوج ، ستظهر هذه الحقيقة أيضًا. يستمر هذا ليس فقط رغبة الشابة ، ولكن أيضًا كضغط اجتماعي من الأسرة إلى المجتمع. لا توجد وسيلة لتنظيم امرأة. المرأة الثورية والمنظمة ستغير الرجل أيضًا. الحياة المتساوية والحرة هي الجمال الذي يستحقه كل رجل وامرأة.

يتطلب JKŞ من المرأة التي تريد اتخاذ قراراتها الخاصة وترى ذلك في الزواج أن تعمل بجد لتحقيق مستوى من حرية الإقناع الثورية.

العنف ضد المرأة آخذ في الازدياد ،

لوحظت حالات انتحار الإناث. العنف ضد المرأة ليس حتميا. لكي تخرج المرأة عن صمتها ضد العنف من الضروري زيادة الوعي. يحتاج عمل JKŞ لجلب هذا النصب التذكاري إلى النساء إلى تحديد مسؤوليته الرئيسية. في كل مجال في المنظمة يجب تعميقها وزيادة تنوعها التنظيمي. يجب أن يكون التعليم الأيديولوجي والسياسي مستدامًا بالتأكيد.

يجب اعتبار كل اجتماع ، وكل زيارة إلى منزل أو مكتب ، وكل اجتماع للمجلس بمثابة تدريب. يجب ألا نكون جيران وأصدقاء للمرأة ، يجب أن نكون رفقاء ثوريين. يجب أن تستمر أعمال البناء الثورية في المنازل بلا هوادة. إن الثورة البعيدة عن الوطن في الحياة الاجتماعية ستكون عاجزة أينما ذهبت.

يجب أن تلعب JKŞ دوره القيادي من أجل الحفاظ على مكانة ثورتنا التي تم كسبها على المساواة والحرية المكتسبة بين الشعوب.

جمعيات JKŞ وكل رئدات JKŞ مسؤولون عن دفع ثورتنا النسائية دون انقطاع.

وحدت ثورتنا النساء الكرديات والعربيات والأرمن والآشوريات والأيزيديات من جميع الجنسيات والمعتقدات في النضال من أجل تحرير المرأة من قبل النظام الراسمالي القمعي. النساء اللواتي بيوتهن وقراهن بعيدة عن بعضهن البعض ، ومعتقداتهن لا تختلف اليوم ، إنهن يقظات في نفس المناصب ، ويشغلن مناصب في نفس المجالس ، ويقومن بجميع مهام الثورة معًا. سوف يهزم الاتحاد النسائي الغزاة في الجبال والمدن وسيواصل بحزم المسيرة في بناء حياة جديدة.

انتصار إم انتصار



# TKŞ: Cejna Zimanê Kurdî Pîroz Be

Di 15'ê Gulana 1932'an de rewşenbîr û ronakbîrê Kurd Celadet Elî Bedîrxan dest bi weşandina Kovara Hawarê kir. Kovara Hawar, bi tîpên Latînî hat çapkirin û di dîroka Kurdî de werçerxeke girîng e. Di wê demê de gelek netewe hewil didan ku derbasî tîpên Latînî bibin. Li Yekîtiya Sowyetan jî rewşenbîrên Kurd li ser zimanê Kurdî û bi tîpên Latînî nivîsandina wê gelek lêkolîn dikirin. Kovara Hawar bû lûtkeya girîng a bîra gelê Kurd.

Di mercên ku welatê me hatiye çar parçe kirin, bi zimanên cuda siyaseta asîmîlekirinê tê meşandin, li Kurdistanê dewletên mêtînger komkujiya Kurdan pêk tînin de Kovara Hawar gelê me bi bîrdariya neteweyî perwerde kir. Bi parastina ziman hebûna neteweyî parast. Yekîtiya neteweyî, giyanî û çandî ava kir. Di wêje, çand, huner, dîrok û hwd. de bû dibistaneke mezin ji bo gelê me.

Ji bo gelên bindest parastina ziman têkoşîna herî mezin a neteweyî ye. Ger ku netewek nikaribe zimanê xwe biparêze dê nikaribe hebûna xwe jî biparêze. Dewletên mêtînger ji ber vê yekê her dem êrîşî zimanên me kirine. Têkoşîna ku ji bo Kurdistana azad û serbixwe tê meşandin û têkoşîna ji bo ziman tê meşandin yek in. Ji ber vê ye ku divê têkoşîna ji bo ziman tê meşandin bi şoreşeke civakî û neteweyî re bibe yek.

Di Yekîtiya Sowyetan de ji bo pêşxistina zimanê Kurdî bi destê serweriya karkeran dibistan, zanîngeh, radyo hatine avakirin, rojname û kovar hatine derxistin. Ev gav di pêşketina ziman û bîrdariya Kurdî de xwedî roleke girîng in. Dîsa şoreşa me ya Rojava zimanê Kurdî bi fermî diparêze, di her kêlî û qadên jiyanê de bi hemû derfetên xwe hewil dide ku zimanê me pêş bixe. Rejîma faşîst û mêtînger a dîktatoriya BAAS ne zimanê me dipejirîne ne jî dev ji dijminahiya xwe ya gelê me berdide. Lê, çi bike jî êdî vê berhema bi nirx a gelê me nikare ji holê rabike.

Gelê Kurd li her derê pêwîst e li vê berhem û nirxê xwedî derbikevin. Zimanê xwe biaxivin, binivîsinîn, fêr bibin û fêr bikin. Ji bo ku zimanê me li her derê bi fermî were pejirandin em têkoşîna ziman bi bîrdariya netewî bilind bikin. Em xwedî li berhema netew û ronakbîrên xwe derbikevin.

# GELEKÎ KU TU CARÎ NAYÊ RADESTGIRTIN: FILÎSTÎN



Filîstîn, bi salan e di bin dagirkeriya siyonîzma Îsraîlê de ye. Netewên Yekbûyî di sala 1947'an de Filîstîn kir du parçe û ji nivî zêdetir axên Filîstînê da koçberên Yahûdî. Heta wê dîrokê li ser wan axan tenê ji %47 Yahûdî rudiniştin. Di sala 1948'an de bi avakirina dewleta Îsraîlê 750.000 hezar Filîstînî ji axên xwe hatin derxistin û ev rewş jî bi mehrûmkirina koçberan a vegerîna ser axa xwe bi encam bû. Filîstiniyên ku di sînorên Îsraîlê de man e ji wargehên xwe hatin dûrxistin, ji mafên ku hatine dayin Yahûdiyan mehrûm hatin hiştin û di hiyerarşiya civaka Îsraîlê de wek tabaqata herî jêr hatin cih kirin.Di sala 1967'an de jî Îsraîlê bi karanîna Îsraîlê herêmên ku wek Gaze û Şerîaya Rojava tê naskirin dagir kir. Piştî dagirkeriyê Filîstiniyên ku li şerîda Gaze û Şerîaya Rojava jiyan dikin ji dewleta eydî xwe mehrûm hatin hiştin û di bin dagirkeriya biyanî de, bi sedan noxteyên kontrole, bi tehdîdên kuştinê mahkûmî bêkarî û birçîtiyê hatin kirin. Piştgiriya dagirkeriya axên Filîstînê bi pîvaneke mezin ji aliyê dewletên emperyalî yên wek Emerîka û ji hinek dewletên herêmî ku ji vê dagirkeriyê berjewendiyên wan hene tê kirin.

**Li Filîstînê Dîroka Têkoşîna Tevgerên Jin**

Li Filîstînê tevlîbûna jinan ya berxwedanê bi zêdebûna koçberiya Yahûdiyan destpêkê de li beşên gundewariyan destpê dike. Jin di dîroka Filîstînê de cara yekemîn di sala 1911'an de li herêma Affula li dijî kiryarên Yahûdiyan tevlî şerê çekdarî dibin. Ev Tevgera jinan dihêle ku berxedan bigêhêje nava hemû civakê bibe. Ji ber vê di vê demê de tevlîbûna jinan a şerê çekdarî weke zayîn tê peşirandin. Piştî vê jî Tevgera jinan bi gelek cure çalakiyan mezin dibe. Di têkoşîna netewî ku di salên 1920'an de destpê dike bi pêşengtiya jinên eydî çîna dewlemend hinek rêxistinên jinan derdikevin holê. Yekîtiya Jinên Ereb ên Filîstînî ku di sala 1921'an de li Kûdûsê tê avakirin, Komeleya Îslamî ya Netewî ya ku di sala 1925'ande tê ava kirin, û cemiyeta parastina zarokan ku di heman salê de li Yafayê tê avakirin hinek ji van rêxistinan in. Jinên Filîstînî heta 1929'an wek xebatên alikarî, çalakî, avakirinên dibistanên keçikan, lojîstîk, avakirina têkîlîyên veşartî yên di nav rêxistinê de didin meşandin.

Di sala 1929'an de jinên Filîstînî li tundiya ku zêde dibe kongreya Jinên Ereb ên Filîstînî lidar dixin. Bi vê kongreye mezinkirina întîfadaya Filîstînê tê hedefgirtin. Jin di aliyê din de li dijî kiryarên mandayên Îngilîzî jî xebata ragihandin û propagandayê didin meşandin ku van kiryaran bi hemû cîhanê bidin naskirin. Di aliyê din de li dijî têkoşînkirina dagirkeriyê û rêxistinkirina jinan piştgiriyeke mezin didin têkoşîna çekdarî bi xwe dibin kirdeyên berxwedanê. Li ser vê esasê di sala 1933'an de li Yafayê bi navê Zahrat Al-Ukhawan koma jinên bi sîlex tê avakirin. Jin heta sala 1948'an di zerengiya siyasî, leşgerî û civakî de tevlî berxwedanê dibin. Piştî ku dewleta Îsraîlê di sala 1948'an de wek dewlet tê pejirandin piraniya jinên Filîstînî mecbur dimînin û axên xwe diterîkînin. Di salên 1960'an de bi avabûna rêxistinên Rêxistina Rizgariya Filîstînê ji bo Tevgera Jinan dibe xala werçerxê. Jin bi avabûna rêxistinê bi awayekî girseyî tevlî komên berxwedanê dibin di navbera salên 1965 û 1966'an de perwerde dibin. Di Konferansa Kûdûsê ku di sala 1965'an de tê lidarxistin de Yekîtiya Jinên Filîstînî tê îlankirin. Yekîtiya Jinên Filîstînî ji bo pêşketina jinan gelek xebatan dide meşandin. Întîfadaya yekemîn ku di sala 1987'an de destpê dike hem ji bo berxwedana Filîstînê hem jî ji bo tevgerên jin ên Filîstînê dibe xala werçerxê. Ev dem dibe serdemeke nû. Tevlîbûna jinan a berxwedanê di nav berxwedanê de rengê jinan hîna xuyatir dike.

**Jin Vîna Berxwedanê ya ku Serî Natewîne ye**

Li Filîstînê jin kirdeyên çalak ên berxwedanê ne. Di komkujiyên bêhejmar ku Dewleta Îsraîlê heta niha pêk aniye heta niha bi hejmareke gelekî mezin jin hatin qetilkirin, hatin şkencekirin, hatin tehdîd kirin, di bin çavan de rastî destdirêjî û tacîzê hatin, hatin xistin zindanan, di şekenceyan re hatin derbaskirin. Bandoreke din a li ser jinan mêtîngehkirina keda jinê bû. Keda jinê wek keda jinên Filîstînî wek keda herî erzan hat hesibandin.

Li dijî Îsraîl û siyonîzmê de jinan ax, mal, kolan û taxên xwe parastin, bi lêhengî şer kirin. Carinan di mewziyan de di destê wan de sîlax, carinan di destê wan de kevir li ser qelaçeyan, carinan li paş cepheyan di qadên lojîstîk û tenduristiyê de, carinan di zindanên Îsraîlê de an jî li der ve di çalakiyên piştgiriya girtiyên zindanan de bi rihekî fidayî li ber xwe dan.

**Sembola Berxwedanê Leyla Halîd**

Têkoşîna jinên Filîstînê di her serdemê de jinên pêşeng derxist holê. Ji navên pêşeng a berxwedanê Leyla Halîd bi bîr anînê li vir heq dike. Leyla Halîd piştî bûyerên Îlona 1970'an de ku nêzikî 8 hezar kesî jiyana xwe ji dest daye û wek "Îlona Reş" tê naskirin de tevî çar çalakiyên revandina balafiran bû. Leyla Halîd di cîhanê de wek jina yekemîn ku çalakiya revandina balafirê pêk aniye derbasî dîrokê bû. Leyla Halîd di 29'ê Tebaxa 1969'an de bi çalakiya xwe ya revandina balafira Los Angeles- Tel Avîv bala tevahî cîhanê kişand ser doza Filîstînê. Jinên Filîstînî hem ji bo gelê xwe, hem ji bo mafa jinê têkoşîna edaletê dimeşîne. Li dijî zewaca zêde, ji bo hebûna nasnameya jin, ji bo mafa perwerde û kar, ji bo wekheviya navbera jin û zilam têkoşîn dide meşandin. Jinên Filîstînê di aliyekî de li dijî dagirkeriya Îsraîlê, di aliyekî de jî li dijî feraseta baviksalarî û hêzên polîtîk-îslamî yên paşverû têdikoşe. Jinên Filîstînî ku di bin navê namûsê de bi qetlîam, tundiya zilam ve rû bi rû dimînin di bin nirxên kevneşopî yên civakî ya baviksalarî de rastiya zayenda duyemîn, zayenda bindest bi hemû cûreyan jiyan dike. Xisleta têkoşîna jinên Filîstînî, hem wergirtina têkoşîna li dijî dagirkeriyê, hem jî wergirtina têkoşîna azadiya jin pêwîst dike. Heta niha têkoşîna jin ku aliyê xwe yê di dagirkeriyê xurt e wê her ku biçe ber bi têkoşîneke li dijî pergala civakî ya baviksalarî ve pêş bikeve. Xwedî lê derketina têkoşîna dîrokî ya gelê Filîstînê û pêşxistina piştgiriya enternasyonalîst di nav erken şoreşa me ya Rojava de ye. Pêşxistina şoreşa Rojava ber bi şoreşa Kurdistan û şoreşên herêmî yên Rojhilata Navîn ve bi mezinkirina têkoşînên Yekbûyî yên gelan û xurtkirina wê gengaz dibe. Wek jinên ji Rêveberiya Xweseriya Bakur û Rojhilatê Sûrî ji bo mil dane têkoşîna jinên Filîstînî û ji bo xurtkirina rêhevaltiya jin divê em wek jinên JKŞ'yî hem bi gotina xwe, hem jî bi çalakiya derkevin pêş.

Wê jinên Rojava û Filîstînê ser bikevin, wê dagirker bin bikevin. Bijî Rêhevaltiya Jin

# الكثير الذي لن يتم استسلامه أبدًا : فلسطين



كانت فلسطين تحت الاحتلال الإسرائيلي منذ سنوات. ضمت الأمم المتحدة فلسطين عام ١٩٤٧ وأعطت أكثر من نصف أراضيها الفلسطينية للمهاجرين اليهود. حتى ذلك التاريخ ، كان ٤٧٪ فقط من اليهود يعيشون على تلك الأراضي. مع قيام دولة إسرائيل عام ١٩٤٨ ، طُرد ٧٥٠ ألف فلسطيني من أراضيهم ، مما أدى إلى تهجير المهاجرين الفلسطينيون الذين بقوا داخل حدود إسرائيل طُردوا من معسكراتهم وحُرموا من حقوقهم ووُضعوا في أسفل هرم المجتمع الإسرائيلي المعروف بغزة والضفة الغربية المحتلة.

بعد الاحتلال حُرم الفلسطينيون المقيمون في قطاع غزة والضفة الغربية من دولة العيد ، وتعرضوا لمئات من نقاط التفتيش تحت الاحتلال الأجنبي ، محكوم عليهم بالإعدام بسبب البطالة والتجويع. يتم دعم احتلال الأراضي الفلسطينية إلى حد كبير من قبل الدول الإمبريالية مثل الولايات المتحدة وبعض الدول الإقليمية التي لديها مصالح خاصة في هذا الاحتلال.

## تاريخ نضال المرأة في فلسطين

تبدأ مشاركة النساء في المقاومة في فلسطين مع زيادة الهجرة اليهودية في البداية في المناطق الريفية. تنضم النساء إلى الكفاح المسلح لأول مرة في تاريخ فلسطين عام ١٩٢١ في منطقة أفولا ضد تصرفات اليهود. تسمح هذه الحركة النسائية للمقاومة بالانتشار في جميع أنحاء المجتمع. لذلك ، في هذا الوقت ، تعتبر مشاركة المرأة في النزاعات المسلحة حقًا مكتسبًا عند الولادة. بعد ذلك نمت الحركة النسائية مع العديد من الأنشطة. في النضال الوطني الذي بدأ في عشرينيات القرن الماضي بقيادة نساء العيد الثريات ، ظهرت بعض المنظمات النسائية. ومن هذه المنظمات الاتحاد النسائي العربي الفلسطيني ، الذي تأسس في القدس عام ١٩٢١ ، والجمعية الوطنية الإسلامية التي تأسست عام ١٩٢٥ ، وجمعية حماية الطفل التي تأسست في يافا في نفس العام. استمرت المرأة الفلسطينية في العمل كعاملة إغاثة ، وناشطات ، وبناء مدارس للفتيات ، وتوفير الخدمات اللوجستية ، وإقامة علاقات سرية داخل المنظمة حتى عام ١٩٢٩.

في عام ١٩٢٩ ، نظمت النساء الفلسطينيات مؤتمرًا للمرأة العربية الفلسطينية لتصعيد العنف. يهدف هذا المؤتمر إلى تصعيد الانتفاضة الفلسطينية. من ناحية أخرى ، عملت النساء على نشر الدعاية والدعاية ضد تصرفات الانتداب البريطاني من أجل التعريف بهذه الأعمال للعالم أجمع. من ناحية أخرى ، أولئك الذين يدعمون بقوة النضال ضد الاحتلال وتنظيم المرأة ، فإن الكفاح المسلح نفسه يصبح أعمال مقاومة. على هذا الأساس ، في عام ١٩٣٣ ، تشكلت في يافا مجموعة من النساء تدعى زهرة الأخوان. حتى عام ١٩٤٨ ، شاركت النساء في المقاومة السياسية والعسكرية والاجتماعية. بعد الاعتراف بدولة إسرائيل كدولة عام ١٩٤٨ ، أجبرت معظم النساء الفلسطينيات على الفرار من أراضيهن.

أصبح إنشاء منظمة التحرير الفلسطينية للحركة النسائية في الستينيات نقطة تحول. انضمت النساء إلى المجموعة بشكل جماعي مع تشكيل المنظمة تم تدريب مقاتلي المقاومة بين عامي ١٩٦٥ و ١٩٦٦. أعلن الاتحاد النسائي الفلسطيني في مؤتمر القدس عام ١٩٦٥. يعمل الاتحاد النسائي الفلسطيني بجد من أجل النهوض بالمرأة ، وكانت الانتفاضة الأولى ، التي بدأت عام ١٩٨٧ ، بمثابة نقطة تحول لكل من المقاومة الفلسطينية والحركة النسائية الفلسطينية. هذه المرة تصبح حقبة جديدة. مشاركة المرأة في المقاومة تجعل لون المرأة أكثر وضوحا.

## المرأة أمال المقاومة هي التي لا تستسلم

تلعب النساء في فلسطين دور فاعل في المقاومة. في المجازر التي لا تعد ولا تحصى التي ارتكبتها دولة إسرائيل حتى الآن ، تم قتل وتعذيب وتهديد وتعرض للاعتداء والتحرش الفعلي وسجن وتعذيب عدد كبير من النساء. تأثير آخر على المرأة هو استغلال عمل المرأة. كان عمل المرأة يعتبر أرخص عمل للمرأة الفلسطينية.

ضد إسرائيل والصهيونية دافعت النساء عن أراضيهن ومنازلهن وشوارعهن وأحيائهن ، وقاتلن ببسالة. في بعض الأحيان في المناصب التي يحتفظون بها بأيديهم ، وأحيانًا في أيديهم بالحجارة على الحصون ، وأحيانًا خلف الخطوط الأمامية في مجالات الخدمات اللوجستية والصحية ، وأحيانًا في السجون الإسرائيلية أو في الخارج في أنشطة دعم الروح التضحية.

## رمز المقاومة ليلى خالد

أدى نضال المرأة الفلسطينية إلى ظهور قيادات نسائية في كل عصر. **ليلى خالد** ، إحدى الأسماء البارزة في المقاومة ، تستحق الذكر هنا. ليلى خالد تورطت في أربع عمليات اختطاف بعد أحداث سبتمبر ١٩٧٠ التي قتل فيها ما يقرب من ٨٠٠٠ شخص وتعرف باسم "سبتمبر الأسود". دخلت ليلى خالد التاريخ كأول امرأة في العالم تنفذ عملية اختطاف. لفتت ليلى خالد انتباه العالم كله إلى القضية الفلسطينية في ٢٩ أغسطس ١٩٦٩ باختطافها لطائرة لوس أنجلوس تل أبيب. تناضل النساء الفلسطينيات من أجل العدالة لشعبهن ومن أجل حقوق المرأة. إنها تحارب الزواج المفرط ، من أجل وجود هوية أنثوية ، من أجل الحق في التعليم والعمل ، من أجل المساواة بين المرأة والرجل. تقاتل النساء الفلسطينيات من جهة ضد الاحتلال الإسرائيلي ، ومن جهة أخرى ضد العقلية الأبوية والقوى السياسية الإسلامية المتخلفة. تواجه النساء الفلسطينيات القتل والعنف الذكوري باسم الشرف تحت القيم في التقاليد الاجتماعية الأبوية ، يعيش واقع الجنس الثاني ، الجنس المضطهد بجميع أشكاله. تتطلب طبيعة نضال المرأة الفلسطينية النضال ضد الاحتلال والنضال من أجل تحرير المرأة.

حتى الآن ، سيستمر نضال النساء اللواتي لديهن جانب قوي في الاحتلال ليقود إلى نضال ضد النظام الاجتماعي الأبوي. إن ظهور النضال التاريخي للشعب الفلسطيني وتطوير الدعم الدولي من مهام حربنا الغربية. إن تطور ثورة روج آفا نحو الثورة الكردستانية والثورات الإقليمية في الشرق الأوسط ممكن من خلال تكثيف وتقوية النضالات الموحدة للشعوب. بصفتنا نساء من منطقة الحكم الذاتي في شمال وشرق سوريا ، فقد دافعنا عن نضال النساء الفلسطينيات ومن أجل تمكين المرأة ، ويجب علينا ، كنساء JKŞ ، أن نتولى زمام القيادة شفهيًا وعمليًا. ستنتصر نساء روج آفا وفلسطين ، وسيسقط المحتلون

تحيا صداقة المرأة



# Bi Rihê 8’ê Adarê, Newroz û 1’ê Gulanê
# Ber Bi Serkeftinê Ve




Pêvajoya Adar û Gulanê di dîrokê de her sal wek bi dîroka berxwedana jin, gelê Kurd û karker û kedkarên cîhanê dagirtiye. Meha Adarê bi roja 8’ê Adarê roja cîhanî ya jinên kedkar destpê dike û bi serhildina Newrozê ya tevahî gelên Mezopotamyayê berdewam dike. Meha Gulanê bi têkoşîna 1’ê Gulanê roja têkoşînê ya cîhanî ya karker û kedkarên cîhanê destpê dike. Dîsa meha Adarê komkujiyên 12’ê Adarê ya Qamişlo 16’ê Adarê ya Helepçê werdigire hundirê xwe. Wateya vê pêvajoyê tenê bi rojên sembolîk ne sînordar e.

Ger ku em vê pêvajoyê di aliyê têkoşîna azadiya jin de binîrxînin ji bo her rojê em dikarin encamên gelekî mezin derxin holê. Destpêkê de jin wek her sal îsal jî di roja 8’ê Adarê de li seranserî cîhanê bi mîlyonan daketin qadan û li dijî feraseta baviksalarî ya kapîtalîzmê ji bo edalet, wekhevî, li dijî tundiya zilamperest, destdirêjî, mêtîngehiya keda li ser jinê denga xwe bilindkirin. Li gelek welatan jinan bi rêya girêva jinê 8’ê Adarê pêşwazîkirin.

Ji Tirkiyê heta gelek welatan jin di roja 8’ê Adarê de rastî tundiya polîsên dewletê hatin. li Rojava û Bakurê Sûrî bi hezaran jin li dijî dagirkeriyê, li dijî feraseta baviksalarî ya civakî 8’ê Adarê zivirandin roja berxwedan û têkoşînê. Ji Lûbnênê heta Misirê, Ji Tûnûsê heta Îranê jinan li dijî feraseta baviksalarî ya ku hebûna jinê tune dike, li dijî çîna kapîtalîzmê bi şiyarên çînî, zayendî, û edaletê, li dijî komkujiyên li ser jinê daketin qadan. Li çar parçeyê Kurdistanê heta çiyayên azad jinên Kurd careke din li dijî mêtîngêrî û dagirkeriyê vîna jinê bilind kirin. Li Tirkiyê jinan li dijî êrîşên polîsên AKP û MHP bi pevçûn û paş de vegerandina van êrîşan vîna 8’ê Adarê xurtkirina. Hêza 8’ê Adarê vegeriya vîna Newrozê û bi mîlyonan jin Kurd û jinên bindest ji bo mafên xwe yên netewî bûn çirûska meha Adarê.

Newroza 2022’an careke din bû îlana tevahî gelê Kurd û jinan. Gelên bindest ji Amadê heta Stenbolê, ji qadên şoreşa Rojava heta Başûrê Kurdistanê, ji çiyayên Azad heta Rojhilatê Kurdistanê bû mesaja berxwedana li dijî dagirkeriyê.

Gelên bindest, karker û kedkarên cîhanê, tevahî jinên bindest bi hêza 8’ê Adarê û Newrozê vîna 1’ê Gulanê di her qadê de bilindkirin. 1’ê Gulanê wek roja têkoşîna karker û kedkarên cîhanê di seranserî cîhanê de bi şiyarên çînî di her qada cîhanê de hat pîrozkirin. Jinên bindest ji bo mêtîngehiya li ser keda jinê, ji bo edalet, mafên zayendî û netewî vîna 1’ê Gulanê pêşwazîkirin. Lê kêmasiya 1’ê Gulanê destpêkê de li Rojava û her çar parçeyê Kurdistanê de di milê tevlîbûnê de kêm ma. Îro merhaleya şoreşa Rojava ya demokratîk ku hatiye bi dest xistin bi destkeftinên çînî û pêşxistina hişmendiya çînî dikare bê misogerkirin.

Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) û Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) divê 1’ê Gulanê bi vê zanebûnê bigirin dest. Ji ber ku asta şoreşa demokratîk bi derbasbûna asta sosyalîzmê tê misogerkirin, asta herî bilind a bêsînor û bêçîn jî asta komûnîzmê ye. Di pergala sosyalîzm û komûnîzmê de çîna karkeran, proleterya û keda jinê, zayenda jinê û ciwanan, keda civakî nirxa herî bilind û nirxa herî hêja ye. Divê nayê ji bîra kirin ku asta şoreşê ya duyemîn sosyalizm çiqasî pêş dikeve asta yekemîn a demokratîk ew qasî tê misogerkirin.

Îro di hemû cîhanê de bi destê dewletên emperyalî şerekî gelekî mezin tê meşandin. Di çar parçeyê Kurdistanê de bi îxaneta PDK’ê, bi piştgiriya dewletên emperyalî û bi destê dewleta Tirk a dagirker şerê hebûn û tunebûnê tê meşandin. Ev tevahî êrîş û şer di aliyekî de hebûn û destkeftinên jinê hedef digirin.

Bi mîlyonan jinên ku di vê pêvajoyê de ji bo mafên xwe daketin qadan îro pêwîst e bi têkoşîneke yekbûyî jin di her qadê de li dijî dagirkeriyê û şerên emperyalî bisekinin. Dewleta Tirk çawa ku li aliyekî li hember me şer dide meşandin di aliyê din de li dijî tevahî gelên Rojhilata Navîn dide meşandin. Ji ber vê yekê pêşeroja gelên bindest û pêşeroja şoreşên jin girêdayî têkoşînên hevbeş e. Avakirina mêkanîzmeyên têkoşînên yekbûyî yên hevbeş qasî ku erka şoreşa me ya Rojava ya jin e, ew qas jî erka Jinên Komûnîst e. Ji ber ku îro şerekî herêmî tê meşandin wê demê li derdora şoreşên herêmî derxistina bernameyeke têkoşîna hevbeş erka herî pêşdatir e. Xwedî lê derketina vîna şoreşa Rojava ya jin mezinkirina tevgera têkoşîna azadiya jin a giştî ye. Niha dem dema bi rihê berxwedana 8’ê Adarê, Newroz û 1’ê Gulanê xurtkirina meşa ber bi salvegera 19’ê Tirmehê ya şoreşa me ya.

**Bijî Şoreşa me ya Jin**

**Bijî têkoşîna Yekbûyî ya Hevbeş**



# بروح 8 اذار نوروز و 1 أيار نحو النجاح

تميزت مسيرة آذار وأيار كل عام بتاريخ مقاومة النساء والشعب الكردي وعمال العالم. يبدأ شهر مارس في الثامن من مارس ، اليوم العالمي للمرأة العاملة ، ويستمر مع انتفاضة نوروز لجميع شعوب بلاد ما بين النهرين. يبدأ شهر مايو في الأول من مايو ، وهو اليوم العالمي لنضال العمال والعمال في العالم. مجزرا ١٢ آذار في القامشلي و ١٦ آذار في حلبجة. لا يقتصر معنى هذه العملية على الأيام الرمزية.

